

## USCIRF—RECOMMENDED FOR SPECIAL WATCH LIST

Encumena Azadiya Dîni ya Navneteweyî ya DY (USCIRF) encûmeneke azad û cotpartiyî ya DY ye ku li derveyê welêt çavdêriya serbestiya dîni û baweriyê dike. USCIRF-a ku li ser hîmê Qanûnê Azadiya Dîni yê Navneteweyî (IRFA) yê 1998ê avakirî ye, di seranserê dinyayê de ji bo çavdêriya bînpêkirinên azadiya dîni û baweriyê de standardên Navneteweyî bi kar tîne û ji serekî, wezîrê karen derve û Kongresê re salixê şîretên siyasete pêşkêş dike. USCIRF, dezgeheke ji Wezîriya Dewleta DY cuda ye û azad e. Raporta Salane ya 2021î encama xebatên yek salekê ya bibelgekirina ji alî Komîsyoneran û karkirên profesyonel ve bînpêkirinên qadê û şîretên siyasatên hikûmeta DY nîşan dide. Raporta Salane ya 2021î heyama ji çileyê paşîn ê 2020î heta çileyê pêşîn ê 2020î digire nava xwe lê di hin rewşan de hin bûyerên giring ên berî yan piştî vê heyamê jî tên xuyandin. Ji bo zanyariya bêtir a li ser USCIRF-ê, [li vê siteya](#) înternetê binihêrin yan jî ji jimara telefona 202-523-3240ê bi USCIRFê re yekser têkilî bikin.

### BIDESTKETÎYÊN HÎMÎ

Di 2020î de li Îraqî rewşa serbestiya dîni, digel Peymana Asayîşa Sincarê ya wisa xuya bû ku giring bû ya ji alî Hikûmeta Herêma Kurdistanê (KRG) û Hikûmeta Îraqa Federal (IFG) ji bo parastina kêmaniyên dîni di çîriya pêşîn de hat îmzekirin jî, xerab ma. Hema hema piştê 4 salên têkçûna Dewleta Îslamî ya Îraqê û Şamê (DAÎŞ), kêmaniyên dîni û yên nijadî yên Deştên Nînovayê û Sincarê hê jî di warê vegera kesên ji cihên xwe bûyî (IDP) û bextxwazên xwastin ji kempan vegeerîna bajar û malên xwe bi [zehmetiyên mezin](#) n re rûbirû man. Di nava potansiyela [ji nû ve derketina](#) komên DAÎŞê û wek DAÎŞê de di nava van koman da tîrsa zordestiyê ya nûbûyî mezin dibe. Komên çekdar ên bi desteka Îranê yên di binê Hêza Seferberiya Navdar (PMF) ya wek Yekîneyên Seferberiya Navdar (PMU) jî tên zanîn, nexasim li Bakurê Îraqê destwerdanên xwe yên timî yên ber bi kêmaniyên dîni û nijadî ve dewam kirin û baştirkirina rewşa serbestiya dîni [zehmettir](#) kirin. PMF di 2020î de li Deştên Nînovayê û li Sincarê bê ceza bizivî û li dijî komên demeke dirêj e êşê dikişînin, bînpêkirinên kirêt pêk anîn.

Her çend alîkarîya însanî ya ji Dewletên Yekbûyî û xwebexşên din ên navneteweyî hatî alî çêtirkirina jêzemîna ku DAÎŞê li bakurê Îraqê kir jî, beşeke giring a kêmaniyên dîni û nijadî yên ji warên xwe dûrxistî di 2020î de gava vegeerîyan malên xwe yan li malên xwe jîyan, xwe di rewşeke ewle de nedîtin. [Bêtirî milyonek](#) Mislîmanên Erebb ên Sînnî bi zorê jicîhbûyî man, hem li hundirî û hem li derve. Piraniya yên bi alîkarîya DAÎŞê dihatin gunehbarkirin yan ew guman ji wan dihat kirin li herêmên kevn ên di binê destê DAÎŞê de tirsîyan eger vegeerîyan malên xwe de hefî ji wan bê

hilanîn. Nemaze kêmanîya Êzîdî bê parastin ma, hê jî li Rojhilata Navîn û pêş wê bi awayekî mezin [belavbûyî](#) ye û ji bo bi awayekî ewle vegera wan a li Sincarê keyseke sînorkirî heye. Jîyana li IDPê û kempên bextxwazan, Êzîdîyan ji gefên endamên DAÎŞê û komên din ên çekdar ên neyar re bêtir kir mebest; wek nimûne, di seranserê salê de, DAÎŞê, ji bo wan veguhêze yan wan tevî bizavên xwe yên din ên neqanûnî bike, [nêçîra](#) kur û keçên Êzîdî kir. Tevlî van, di nava salê de bi tenê [çend sedek](#) ji **6.000** qîz û jinên Êzîdî yên DAÎŞê ew di 2014an re revandibûn karibûn bi malbatên xwe re werin kêleka hev; ji ber ku Îraq nikaribû li ser vê zordestiyê raweste, civata Êzîdî bi tevahî bi vê birindariyê hê jî hisiya. Herweha çendîn Filehên Îraqî li bakurê Îraqê di 2020î de [dûrxistî](#) man; yên karibûn vegeerîyan cih û warên xwe, tevî cihên perestîne, dîtin ku milkên wan hatine kavilkirin û bûne malê tevahî.

Li bakurê Îraqê, nexasim li herêma Şingalê êrîşên asîmanî û tevgerên din ên çekdarî yên Tirk ên li dijî Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK), ji ber ku tesîreke bêrêje li ser komên dîni û nijadî yên kêmanî hefî kir, rewşê hê xerabtir kir. Hat danzanîn ku sepeya Tirk ji bo ku li herêmê bûyerên sivilî rû nedin tedbîrên herî kêma sitandine; wek nimûne, di mehên hezîran û temûzê de Tirk, di çarçoveya “Tevgera Pence-Baz” û “Tevgera Pence-Piling”ê de ber bi Sincarê ve çû, ew bû [sebebê jîyana](#) pênc sivilan û bi dehan sivil birindar bûn.

Di 2020î de wek bipêşketineke erênî, KRG, ji bo ku li ser bûyerên kêmaniyên dîni û nijadî yên li herêmê raweste û wan bi pêş ve bibe, Weîriya Karûbarên Kêmanîyan ava kir.

### Jİ HIKÛMETA DY RE PÊŞNIYARÎYIN

- Li gora Qanûnê Azadiya Dîni yê Navneteweyî (IRFA), ji ber tevîbûna bînpêkirinên ciddî yên serbestiya dîni yan xweşbîniyê, Îraqê tevî li Lîsteya Çavdêriya Taybat a Wezîriya Derveyê DY bikin;
- Wek perçeyek ji tēkilîyên dualî yên pêşîktîya bilind, hikûmeta Îraqê teşwîq bikin ew PMFê rawestîne û siyaseta wê daye zanîn pêk bîne, bi taybetî partiyên tundîya mezhebî dewam dikin; li Bakurê Îraqê nahêlin Êzîdî, Fileh û Mislîmanên Sînnî yên Erebb û hêmanên din ên dîni û nijadî vegeerîyan û rewşa wan baştir bibe û/yan li ser berjewendiyên Îranê dest didin protestoyan;

- Gava hemû kêmanîyên dînî û yên nîjadî bên tevlihevkirin li proseyê, teşwîqkirina IFG û KRGê ta ku ew li gora madeyê 140î yê Qanûnê Îraqê cîhên bi nakokî çareser bikin, ji bo vê yekê bi taybetî bikaranîna rêyên dîplomatîk û yên din ên heyî û bi tevlibûna temamê koma Êzîdîyan bi berfirehî pêkanîna Peymana Ewlehîya Şingalê;
- Binpêkirinên serbestîya dînî yên xuyandî bikin hincet û dest daynin ser hebûna kesên navbuhurî û / yan di çarçoveya desthilatên aborî û yên vîzeyê de ketina wan a Dewletên Yekbûyî qedexe bikin û li ser serekên PMFê yên bi darê zorê binpêkirinên serbestîya dînî de rêbertîya tevlibûna çekdaran dikin pêdankirinên bi mebest pêk bînin;
- Alîkarîyê bi kêmanîyên Îraqê yên dînî û nîjadî re bikin ew ji nû ve komên xwe yên ji alî DAIŞê ve rûxandî ji nû ve ava bikin û karibin berjewendîyên xwe biparêzin, tevî ku ew karibin ji bo hevberêvebirîyê karibin dest bi destpêkirina dan û sitandinekê bikin karibin hilbijartinên 'adil û serbest ên xwemalî û herêmi pêk bînin û ji bo vê nûnerên xwe bixwe hilbijêrin.

## KILÎLÊN JÊDER Û BIZAVÊN USCIRFÊ

- *Nûkirina Siyasetê:* [Li Bakurê Îraqê Parastina Kêmanîyên Dînî](#)
- *Danxuyandina Çapemenîyê:* [USCIRF, Tevgerên Leşkerî yên Tirkîyeyê li Bakurê Îraqê Tawanbar Kir](#)

### Piştperde

[Nifûsa Îraqê](#) bi serdestî Mislîman e: ji sedî 64–69 Mislîmanên şîî û ji sedî 29–34 Mislîmanên sînnî ne. Nifûsa Mislîmanên Şîî bi piranî li başûr û rojhilatê herêmên welêt bicîhbûyî ye, herweha Sînnî li rojavayê navenda û bakurê welêt in. Herweha 200.000 Filehên ji mezhebên cihê li wê derê hene; tevî Katolîkan, Ortodoksan, Protestanan, bi piranî li Deştên Nînovaya bakur bicîhbûyî ne. Tevî vê yekê, ji sala 2003yan ve ev nifûsa Filehên Îraqî yên dihat texmînkirin 1,5 milyon in pir kêmbû. Herweha Îraq mala hema hema 700.000 Êzîdîyan e, ku ew hê jî bêtir di hûndirî de jicîhbûyî ne, herweha 150.000 Kakeîyên ku wek Yarsan yan Ehlulheq tînanaskirin, ev her du kom bi piranî li seranserê bakur belavbûyî ne. A paşîn, koma Cihûyan hê jî li Bexda û Hewlêrê bicîhbûyî ye.

### Li Bakurê Îraqê Belavbûna Kêmanîyên Dînî

Komelgeha Êzîdîyan piştî şeş salên ku ji tevkujîya DAIŞê revîya, digel nasnameya dînî û ya nîjadî, hê jî ji bo ku cîh û warê xwe bi dest bixe [zehmetîyên mezin](#) kişand. Nayê zanîn ka bi hezaran jin, qîz û kurên zarok ên revandî li ku derê ne. Digel kefteleştên hevkar ên di nava KRGê û IFGê de ji bo xuyandina cîhên revandîyan û gihandina wan li malbatên wan, gelek kêmbû ji wan di 2020î de karibûn vegerin malên xwe. Hema hema [2.800](#) Êzîdîyên revandî hê jî wenda ne, hat xuyandî ku gelek ji wan hê jî ji bo têkilîya cînsî, kedê yan kafiristanîyê [vequhestî](#) ne. Bêtirî van, gelek ji şervanên DAIŞê yên ji van zordestîyan gunehkar in, digel [daxwazên](#) dayîna hesabê Êzîdîyan, hê jî revîyayî ne.

[Nûkirina](#) Komkara Lêkolîna Encûmena Ewlehîyê ya Yekîtiya Neteweyan (UN) a Teşwîqkirina ji bo Dayîna Hesabên Sûcên ji Alî DAIŞê ve Kirî ya ku di seranserê salê de zordestîyan bi belge kir û gorên komî vedan, yekî hinek bi hîvî kirin.

Digel kefteleştên hikûmeta DY yên navneteweyî yên bipêşvebirina çêtirkirina rewşên jîyana kêmanîyên dînî û nîjadî yên li bakurê Îraqê, di 2020î de [astengîyên](#) giring man. Di Deştên Şengal û

Nînovayê û dora wan, nexasim [hebûna](#) komên çekdar ên PMFê yên bi desteka Îranê û hebûna xalên wan ên kontrolê nehişt kêmanîyên dînî û nîjadî vegerin ser cîh û warên xwe. [Li xalên kontrolê](#) şervanên PMFê xwastin IDP û bextxwaz, nexasim jî kêmanîyên dînî ji bo buhurîne pirr pere bidin yan xwe bixin xetera lêvegera kempen. Wek encameke vê pêkanîyê û yên din, [kêmtirê ji sedî 50yê](#) nifûsa Filehên di tîkçûna DAIŞê ya 2017ê de jicîhkirî, karibû vegere malên xwe. Bi dehhezaren wan li IDP û kempên bextxwazan di zehmetîyê de û mercên neînsanî de man. Filehên ji bo vegera komelgeha xwe kefteleştê dikirin jî bi [zehmetîyên nû re](#) rû bi rû man, tevî kêmasîya xizmetên hîmî, rewşên aborî yên tirsnaq û milkên hatibûn dizîn.

### Li Bakurê Îraqê Zehmetîyên Ewlehîyê

[Hebûna](#) dewam dike ya komên çekdar ên reqîb ên ji alî leyistikvanên cuda yên herêmi yên li bakurê Îraqê berjewendîyên xwe yên cuda hene, di 2020î de nîşana bêminetkirina bêtirkirina ewlehîyê bû. Mebesta [Peymana Ewlehîya Sincarê](#) ya di çîrîya pêşîn de îmzekirî, ji bo kêmtirkirina tansîyonê nava KRGê û IFGê li bakurê Îraqê alîkarîya teşqeleyên ewlehîyê ji xwe re kiribû mebest. Tevî vê yekê, ji ber ku ew fikarên Êzîdîyên koma herî birîndar û bêparastin a Sincarê bi lîv nekiribû, gelek [rexne](#) lê hat girtin. Wek nimûne, peymanê destûr da ku KRG, bêyî tevlikerîna Êzîdîyên herêmê û şewirîna bi wan, serekekî beledîyeyê li Sincarê peywirdar bike. Kêmanîyên dînî, hê jî ji ber ku KRG û IFG li ser bergirîyên ewlehîyê yên herêmên bi nakokî nikaribûne li hev bikin tirsîyane ku keysê bide DAIŞê ew dîsa li herêmên li wan nifûseke giring a kêmanîyan heye derkeve. Wek nimûne, di nîsana 2020î de hikûmeta Îraqê li Hewîce, Kerkukê bi ser maleke ku li bi dehan endamên DAIŞê xwe veşartibûn de [girt](#). Tevî van, [êrîşên asîmanî](#) yên Tirk li bakurê Îraqê tevgerên leşkerî dewam kirin, ji ber ku ew awa herêmên bêparastin ên Êzîdîyên Sincarê bêstîqrartir kir, pirseke din a ewlehîyê jî peyde kir.

## Li Îraqê Rûdanên din ên Serbestîya Dînî

Di 2020î de li herêma KRGê rewşa serbestîya dînî li gora salên çûyî piçek hev girtîtir ma, digel ku hikûmeta herêmê ji bo bipêşvebirina hem kêmanîyên dînî û hem yên nijadî [Wezîrîya Karên Kêmanîyan](#) saz jî kir. Bêtirî van, KRG, hê mêtandariya xwe ya ji bo komên Êzîdîyên, Filehên, Turkmenên, Şebekên ji sedê hezaran kesan bûn ji destê DAIŞê ji cîh û warên xwe reviyabûn dewam kir. Li herêmên bi nakokî û dora wan ji bo van koman kêmasîya ewlehîyê di seranserê salê de dewam kir.

Rewşa serbestîya dînî li Îraqê, hinek jî li bakurê Îraqê lawaz ma. Kefteleftên lihevanîna Mislîmanên Sinnî û Şî'î dewam kiribin jî li gora hat danzanîn gelek kêma hat bipêşveçûyîn. IFG rakirina qanûnên kafirbûnê û vegera ji dînî red kir û bi awayekî fermî naskirina komên kêmanîyên dînî û ne xwedayî hê jî red kir, tevî Bahaîyan, Şahîdên Yehovayî, humanîstan, Kakeîyan û yên din. A paşîn, [proseya](#) "paqijkirina Be'sîbûnê" ya piştî 2003yan ji bo destûrdarên partîya Be'sê ji hikûmetê bîn derxistin hat qebûlkirin û ji wê gavê ve di hiqûqê Îraqê de wek sermîyanek mabû li dijî Mislîmanên Sinnî wek hîmekî cudakarîyê ma û ma.

## KILÎLA SIYASETA D.Y.

Di 2020î de hikûmeta DY digel desteka bernamekirî û pereyî ya komên kêmanîyên nijadî û dînî, desteka xwe ya ji bo baştirkirina tevîbûyîna sivil û bi rêya siyasî ji nû ve avakirina wan dewam kir. Ji têkçûna DAIŞê ya 2017an ber bi vê gavê ve, Nûnertîya Geşepêdana Navneteweyî ya DY (USAID) ji bo alîkarîya jinûveavakirina kefteleftên li Îraqê [bêtirî 438 milyon \\$](#) an alîkarî kir, tevî 38 milyon \$ di 2020î de bi serê xwe. Tevî vê, hikûmeta DY, ji bo alîkarîya bi têkoşîna bi belavbûna COVID-19ê re [60 milyon \\$](#) da hikûmeta Îraqê.

Hikûmeta D.Y. ji bilî van li dijî kesên ji bînpêkirinên mafên mirovan berpirsîyar in, tevdirên cezakirinê derxistin; wek nimûne, di çileyê paşîn ê 2021î de hema piştî dewra danzanînê, Wezîrîya D.Y. ya Gencîneyê, li ser Serekê PMFê û Şîretkarê kevn ê Ewlehîya Neteweyî ya Îraqê Falih Elfeyadî, ji ber pêkanîna bînpêkirinên tirsnaq ên mafên mirovan [pêdankirinên Gerdûnî yên Magnitsky](#)-ê pêk anî. Destûrdarên hikûmeta D.Y. yên li Bexdayê, Hewlêrê û Waşîngton DC-yê bi hevpişeyên xwe yên Îraqê re têkiliyên du alî saz kirin û [çêtkirina](#) anîna rojevê ya arîşeyên serbestîya dînî dewam kirin.